

Wergêrandin ji bo zimanê kurdî



- Wergêrandin huner û zanîne.
- Wergêrandin di navbera du zimanan de pire.
- Wergêrandin ravekirina wateyane û hem guhastina çandekê ji zimanekî heta zimanekî dine.
- Wergêrandina rast û durist guhastina wateyan bi awayê nivîskar û ciwaniya ka pê nivîsiye.
- Wergêrandin di zimanê kurdî de lawaze, guhdan li wergêrandinê nîne.

Li gora dosya we ya taybet ji bo wergêrandinê, dikarim nerîna xwe di wergerê de bi giştî û ji bo zimanê kurdî bi taybetî bidim. Hunera wergêrandinê mîna hemû huneran pênasîne; dema wergêr toreyekê ji zimanekî diguhêze ji bo zimanekî din, bi şeweyê xwe dihêle xwendevan têkeve nav kelepûr, çand û danûstandina ewî mîletê ku xwendevan bi zimanê wî nizane. Ji lew ra hevpeyvîna çandan di riya wergerê de dibe û wergêr navgînê têkeliya her du çandane.

Wergêrandin ev pira ku hevgerîdana toreyan dike, giringiya wê li nav mîletan pir heye. Heger ne bi xêra wergerê ba, dê çawa pênasîna me bi çand, dîrok, tore û hunerên mîletan heba? Wergêrandin berpirsiyariye; hestedarî tê de heye, ne her kes bi hêsanî dikare vê berpirsiyariyê hilgire. Dilsozî di wergêrandinê de girînge. Heger deq yan pertûk bê dilêr hat wergêrandin, wê hingê navê xiniziyê lê dibe.

Lawaziya wergerandinê di zimanê kurdî de:

Tevî ku em her alozî, tengavî, paşketina zanistî, hwd, bi rewşa milî ya giştî ve girê didin, her weha em nikarin lawaziya wergerê jî dûrî evê babetê bikin. Bi dehên salan in ku milletê me bi zimanê serdestan dixwîne û dinivîse. Rojekê ji rojan millet ne dikarî bi azadî zimanê xwe bi kar bihîne û fişara li ser zimanê me tu derfetên şayikbûn û rewaniya zimên ne daye me, ji lew ra em hemû babetan bi zimanê dibistanê ku em wisan fêrbûne bi hêsanî dixwînin.

Aya ku zimanek hemû xwendina me pê be, belge û kaxêtên karûbarê me pê be, em ê çawa bi zimanê dê wê xweşiyê bi hêsanî bidest bixînin?

Mebesta min ji vê mijarê ne ku zimanê kurdî kêmtir ji zimanê (tirkî, farisî û erebî) dibînim, lê belê buhujandina rêkxistî ya ku li millet û zimanê me dibe, hiştiye em ji xweşiya zimanê xwe dûr bikevin.


Wek nimûne, gava xwendevan babetekê li ser tenduristiyê bi zimanê erebî dixwîne, ji ber ku ev babet bi hezarên pelan li ser hatiye nivîsîn, beranber bi kurdî deh gotar li ser nînin. Helbet xwendevan dê xweşiya têgihiştina xwe di erebî de bêtir bibîne.

Di kurdî de kar ji wergerê re nebûye, heger hin pertûk yan gotar hebin, ew jî dikevin rêza çalakiyên kesayetî de heta niha ev cure huner li nav kurdan bê guhdane.

Dibe bêtir mebesta min ji Başûrê Kurdistanê re ye, çimkî li wir

derfeta çalakî û pêşketina ziman û toreya kurdî heye. Lê nayê wateya ku ew nivîskarên şiyana wan yên wergerê hene, li her sê parçeyên Kurdistanê û derveyî welat xwe ji erkên xwe bi paş de bixînin.

Tevî ku ji demekê de ez hin nivîs, helwest û



pertûkên wergerandî ji bo zimanê kurdî dixwînim. Di nerîna min de karekî hêjaye ku nivîskarên me, bi taybetî ew yên ku evî celebê toreyê bi kar dihînin, xwe bigehînin hev û bi hev re bidin û bistînin, ta ku karibin bêtir xwe bi pêş de bibin.

Min hin wergerên pir lawaz jî di nav wan de xwendin, bê berpirsiyarî û bê bawerî wek nimûne helbestin Nizar Qebanî jî erebî kiribûn kurdî; lê mixabin ku wergereke peyvên bê ku li wateyê hay bibin, kiribûn.

Wergerandin ne wergerandina peyvêye bi qasî ku wergerandina wateyê ye. Hin peyv hene di zimanekî de bi deh wateyan tê, lê di zimanekî din de çî wateyan nade.

Her wekî bi zimanê kurdî em dibêjin: (Ez li ber te ketim.) anko derdekî te heye an tiştêk bi serê te hatiye û ez ji bo te xemgîn û tengavim, yan bi xemim. Heger em vê hevokê, peyv bi peyv wergerînin erebî dê wisan bibe (أنا وقعت أمامك) anko ez li pêşiya te li ser xakê ketim. Nimûneyeke din em bi kurdî dibêjin: (Qayişê bi min re nekêşîne.) anku hevrikiyê bi min re neke, heger em peyvên evê hevokê bikin erebî (لا تسحب معي القشاط) anko qayişa ku tu didî piştê xwe bi min re nekêşîne!

Ev du nimûne min anîn, lê weke van bi hezaran di her zimanî de hene.

Kesê ku wergêranê bike, berî her tiştî gerek afirêner be; bi zanîn dahênaniyê di rawekirina hevokên ku wergerîne de bike. Ne tenê wisan belam têgihana wî/ê di her du zimanan de hebe, li hestiyariya wergerandinê haydar bibe.

Wergêran berpirsiyariyeke dîrokiye, ji ber vê jî ez dibêjim; bila wergêr bi hev re di peywendiyên de bin, çimkî karê take di vê mijarê de bi taybetî di rewşa nivîskarên kurd ya îro de bi piranî lawaz tê.

Lê nabe jî em dijberî wergerandina take birawestin, heger lawaz yan xurt be gerek ew bê nirxandin û em jê re palpişt bin, heger lawaz be em şaşitiyan bidin xuyakirin û heger baş be jî em navtêdanê bikin.